Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :465 nameronahi@gmail.com 11-Cotmeh - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî




# Li Girê Spî xebatên çareseriya pirsgirêkên tenduristî

Li Girê Spî û bajarokên girêdayî wê pêdivî bi navendên tendurustiyê heye. Ji ber nexweşxane li navçe û gundan tune ne ji lewra jî welatî zehmetiyan dikişînin. Komîteya Tenduristiyê ya Kantona Girê Spî ji bo ev pirsgirêk bê çareser kirin di nava hewldanan de ye.



Şêniyên kantona Girê Spî bi taybet li bajarok û navçeyên girêdayî kantonê bi hewcedariya navendên tenduristiyê ne. Ji ber ku tenê nexweşxaneyek li bajêr heye û ji ber dûrbûna gundan, şênî zehmetiyan dikişînin.

Pirsgirêka kêmasiya hejmarên navendên tenduristiyê ji berê de li herêmê hebû. Lê şênî li bendê ne ku Rêveberiya Xweser pirsgirêkê çareser bike. Ji ber ku ev pirsgirêk li gorî gotinên wan wek çavkaniya zehmetiyên wan e.




Kantona Girê Spî ji 2 navçeyan ( Eyn Îsa û Silûk), tevî navenda bajêr ku wek navçe tê hesbandin û 7 bajarokan El-Cirin, El-Zêdî, El-Şirke, El-Hîşe, El-Xerze, Elî Baciliyê û Hemam Tirkmen pêk tê.

Tenê li navçeya Silûkê navendeke tenduristiyê û li bajarê Girê Spî nexweşxaneyek heye (Nexweşxaneya Niştîmanî).

Berê naxweşxaneyek li navçeya Eyn Îsa jî hebû lê ji Reqayê re hate veguhestin. Bi vê yekê navçe bê nexweşxane ma.

Ji ber wê şêniyên wan herêman neçar dimînin nexweşên xwe bigihînin nexweşxaneya kantonê. Lê ji ber dûrbûnê û nebaşiya hinek rêyên wan herêman şênî gelek zehmetiyan dikişînin. Hin caran ev pirsgirêk dibe sedema mirina hin welatiyan.

Têkildarî mijarê welatiyê bi navê Ebdilmerûf ê ji bajarokê El-Zêdî yê ku bi zêdetirî 40 km ji Girê Spî dûr e, diyar kir dema pêwîstiya nexweşekî bi nexweşxaneyê bi awayekî lezgîn hebe, bi gelek



pirsgirêkan re rû bi rû dimînin.

Ebdilmerûf wiha dewam kir: “Nexweşxaneyeke taybet û navendeke tenduristiyê li navçeya Silûkê hene. Lê bajarokê El-Zêdî û El-Şirkê ji Silûkê pirr dûr in. Ji ber wê, hin caran ji ber tunebûna erebeyan em zehmetiyan dikişînin.”

Ebdilmerûf destnîşan kir ku nexweşxaneyên taybet gelek pere distînin û ew jî ji bo welatiyan pirsgirêkeke mezin e.

Di dawiyê de Ebdilmerûf bang li rêxistinên tenduristiyê kir ku nexweşxaneyeke niştîmanî ji welatiyan re vekin.

Kantona Girê Spî gelek koçber ji bajarên cuda yên Sûriyê pêşwazî kirine. Li Kampa Eyn Îsa nêzî 13 hezar koçber hene. Lê ji ber kêmasiyên xebatên tenduristiyê li kampê koçber ji bo dermankirinê neçar dimînin berê xwe bidin kantonê.

Endamê Rêveber ê Komîteya Tenduristiyê yê Kantona Girê Spî Elî Osman wiha got: “Em êşên welatiyan dizanin, ji ber wê me navendek li navçeya Silûkê vekir.”

Osman got: “Di demeke nêz de em ê du navendên tenduristiyê li bajarokên ku dûrî navenda bajêr vekin. Ji bo gundên dûr em ê bi komînan re koordîne bikin da ku di rewşên tenduristiyê yên awarte de li beşa destwerdana lezgîn bigerin ji bo ku xwe bigihînin wan herêman.”

Osman wiha dewam kir: “Ji ber ku şênî ji aliyê tenduristiyê ve xemsar in û dema nexweş dibin serdana navendan nakin, tenê li ser destê xwe dermanan dibînin, em ê li gorî plansaziyekê hemleyên zanakirina tenduristiyê bi rê ve bibin.”

Endamê Rêveber ê Komîteya Tenduristiyê yê Kantona Girê Spî Elî Osman destnîşan kir ku gelek rêxistinên tenduristiyê li herêmê hene lê tu alîkariyê pêşkêş nakin. Osman bang li Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanî kir ku ji bo başkirina beşê tenduristiyê alîkariyê pêşkêş bike...*ANHA*



Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 465 11- Cotmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Gêrîla li Lêlikanê derbên giran li artêşa Tirk da



Çalakiyên gêrîlayên HPG’ê li dijî baregehên artêşa Tirk yên li başûrê Kurdistanê dewam dikin. Navenda Ragihandinê ya HPG’ê diyar kir gêrîlayên wan li Lêlikanê li dijî artêşa Tirk a dagirker 9’ê Cotmehê du çalakî kirin. HPG’ê ragihand derbên serkeftî li kozik û stareyên dijmin hatin xistin lê di encama çalakiyê de ji leşkerên dijmin çend hatine kuştin û birîndar bûne, diyar nebûye.*R-2*

# BÎLANÇOYA MEHEKÊ YA ŞERÊ TUNEKIRINA TERORÊ: 651 ÇETE HATIN KUŞTIN

**Hêzên Sûriya Demokratîk di 11’ê Îlonê de Qonaxa Dawî ya Pêngava Bagera Cizîrê bi navê Şerê Tunekirina Terorê dest pê kir. Koalîsyona Navnetewî jî piştgiriya hewayî da pêngavê. Di nava mehekê de QSD’ê derbên giran li çeteyan da û gelek serkeftin bi dest xist.**




## 40 KM ÇARGOŞE ERD HAT RIZGAR KIRIN

Navenda Ragihandin û çapemeniya QSD’ê bi daxuyaniyekê bîlançoya şerê mehekê yê Qonaxa Dawî a Pêngava Bagera Cizîrê a bi navê Şerê Tunekirina Terorê eşkere kir. QSD’ê ragihand ku di nava mehekê de 651 terorîst hatine kuştin û hêjmareke zêde çek û cebilxaneyên çeteyan ketiye destê şervanan. Her wiha QSD’ê ragihand cenazeyên 17 terorîstan ketine destên şervanan û qadeke 40 km çargoşe hatiye rizgar kirin.

## BI SEDAN SIVÎL HATIN RIZGAR KIRIN

QSD’ê ragihand ku hêzên wan bi sedan welatiyên sivîl ku piraniya wan jin û zarok bûn, ji destên çeteyan rizgar kirin û di kampan de hatin bi cih kirin û alîkariya wan hatiye kirin. QSD’ê got, “Yekîneyên taybet ên girêdayî hêzên me 2 jinên Êzidî yên Şengalê ku di destê çeteyan de bûn, rizgar kirin.” Her wiha QSD’ê ragihand ku di encama berxwedaneke mezin de 37 şervanên wan jî şehîd bûne. *R-2*

## Gel wê bi fikrên Ocalan têkoşîna xwe bilind bikin



Nerazîbûnên li dijî tecrîda li Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan berdewam dikin. Rûspiyê êla Benî Sebai ya navçeya Tirbespiyê Hisên El-Sade destnîşan kir ku komploya 9’ê Cotmehê a li dijî Ocalan li dijî hemû gelên rojhilatanavîn yên ku azadî û mafên xwe dixwazin hatiye kirin. *R-4*

## AKP, Tirkiyê bi awayekî çetewarî birêve dibe

Hevserokê KCD’ê Berdan Ozturk, destnîşan kir ku AKP Tirkiyê bi rêbazên “çetewarî” bi rê ve dibe û got, “pirgsirêka Kurd bi rêyên siyaseta demokratîk û muzakereyê wê çareser bibe. 40 sal in şer dewam dike. Dewlet di vî şerî de hemû qirêjiyên xwe xistin dewrê, lê encam negirt.” *R-4*

## Bi hezaran Efrîniyan got, “bê serok jiyan nabe”



Komploya navnetewî a 9’ê Cotmehê a li dijî Rêber Ocalan ji aliyê bi hezara Efrîniyan de hat şermezar kirin. Bi hezaran welatiyên Efrînê ku li Şehbayê bi cih bûne hatin cem hev û komplo şermezar kirin. Welatiyên Efrînê dilsoziya xwe bi Ocalan re anîn ziman û diyar kirin ku ew ê heta dawî ji bo azadiya Rêber Ocalan û rizgarkirina Efrînê di nava têkoşînê de bin. *R-5*

## Emê Minbicê ji êrîşan biparêzin



Dewleta Tirk a dagirker ji bo ku tedbîrên xwe yên parastinê digire gefan li Minbicê dixwe. Cîgirê Fermandarê Giştî yê Meclîsa Leşkerî a Minbicê Ebû Elî Necim diyar ku mafê wane ku tedbîrên xwe yên parastinê bigirin. Ebû Elî got, “Me Minbic bi xwîna sedan şehîdan rizgarkiriye. Em ê Minbicê ji hemû êrîşan biparêzin” *R-5*

## Divê jin li dora yek maseyê rûnin

Li bajarê Elmanyayê Frankfurtê Yekemîn Konferansa Navneteweyî ya Jinan 6-7´ê Cotmehê bi beşdariya 500 jinên ji seranserê cîhanê hate lidarxistin. Jinên ku beşdarî konferansê bûn diyar kirin ku konferansê tesîreke mezin li wan kiriye. Jinan destnîşan kirin ku divê konferansên bi vî rengî dewam bikin, jin bên cem hev û li daro yek maseyê rûnin. *R-3*

# QSD'ê bîlançoya şer a mehekê eşkere kir

**Navenda Ragihandin û çapemeniya QSD'ê bi daxuyaniyekê bîlançoya şerê mehekê yê Qonaxa Dawî a Pêngava Bagera Cizîrê a bi navê Şerê Tunekirina Terorê eşkere kir. QSD'ê ragihand ku di nava mehekê de 651 terorîst hatine kuştin û hêjmareke zêde jî sivîl hatine rizgarkirin.**



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya QSD`ê bi daxuyaniyeke nivîskî bîlançoya şerê mehekê yê qonaxa Şerê Tunekirina Terorê eşkera kir.
Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) bîlançoya mehekê ya Qonaxa Dawî a Pêngava Bagera Cizîrê ya bi navê Şerê Tunekirina Terorê eşkera kir. Li gorî daxuyaniya QSD'ê, bîlançoya şer a mehekê wiha ye:
"Di çarçoveya "Şerê Tunekirina Terorê" yê qonaxa dawîn a Pêngava Bagera Cizîrê de ji bo tunekirina DAIŞ'ê li rojhilatê çemê Firatê, Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) bi alîkariya Hêzên Koalîsyona Navneteweyî ji 10'ê Îlonê ve berxwedaneke dijwar li dijî terorîstan dide meşandin da ku deverên di bin dagirkeriya çeteyên DAIŞ'ê de yên weke Hecîn, Sûsê, El-Şehfê û derdora wan ên gundewarên Dêrazorê rizgar bike.
Hêzên me ji 11'ê Îlona borî ve heta niha serkeftinên mezin bi dest xistine û devereke berfireh ji terorîstên DAIŞ'ê rizgar kirin. Her wiha gelek baregehên çeteyan rûxandin û miqdareke mezin ji çek û cebilxaneya çeteyan desteser kir. Her wiha gelek êrîşên xwekuj ku terorîstan xwestin li dijî şervanan pêk bînin, bê bandor kirin.
Bîlançoya şer û pevçûnên di navbera şervanên QSD'ê û terorîstên DAIŞ'ê de di mehekê de wiha ye:
Hêzên me bi terorîstên DAIŞ'ê re rasterast ketin 58 pevçûnan.
Hêzên Koalîsyona Navneteweyî 215 êrîşên ezmanî û 17 êrîşên topavêjan pêk anîn. Hêzên me piştrast kir ku 651 terorîst hatine kuştin û cenazeyên 17 terorîstan ketine destên şervanan û bi rêk û pêk hatine binaxkirin. Her wiha bi dehan cenazeyên terorîstan li nava baxçeyên deverê li ser erdê mane û hêzên me nikaribûn van cenazeyan ji ber mayinên ku terorîstan çandine, hildin. 6 terorîst dîl ketine destê şervanan. Hêzên me 370 nuqteyên nû bi dest xwe ve anîn û karibûn 40 km erd û gundên El-Baxoz, El-Şeclê û Mûzan rizgar bikin.
Di pevçûnan de hêzên me miqdareke zêde çek û cebilxane bi dest xistin:
Hêzên me her wiha hejmareke mezin ji çek û siwareyên DAIŞ'ê rûxandin û gelek embarên cebilxaneyê û baregehên kombûna çeteyan rûxandin.
Di nava çalakiyên şer de, terorîstên DAIŞ'ê xetên pêşketina şervanan, bi siwareyên bombekirî û kesên xwekuj asteng bikin û gelek caran jî deverên ku jê vedikişiyan mayin dikirin. Terorîstan 37 êrîş li dijî baregehên şervanan pêk anîn. 22 êrîş ji wan bi siwareyên bombebarkirî û 6 bi motorsîklêtên bombebarkirî û 7 êrîşên xwekuj bûn. Hêzên me 246 mayinên ku çeteyan çandine bê bandor bikin.

**2 JINÊN ÊZIDÎ HATIN RIZGAR KIRIN**

Hêzên me bi sedan welatiyên sivîl ku piraniya wan jin û zarok bûn, ji destên çeteyan rizgar bikin û tavilê di kampan de hatin pêşwazîkirin û alîkariya wan hatiye kirin. Yekîneyên taybet ên girêdayî hêzên me karibûn 2 jinên Êzidî yên Şengalê ku di destê çeteyan de bûn, rizgar bikin. Her du jinên Êzidî ev in: "Zaroka bi navê Înas Reşo ya 12 salî ji bajarokê Xanesorê hatiye revandin û Melko Xidir Kûtê 40 salî ye ku ji gundê Koçer ê Şengalê hatiye revandin."
Di nava berxwedana mehekê ya şervanên QSD'ê de 37 şervan piştî berxwedaneke leheng û bêhempa derketin asta şehadetê. Her wiha hejmareke din jî birîndar bûn."

## Gêrîla li Lêlikanê derbên giran li artêşa Tirk da



HPG'ê ragihand li Başûrê Kurdistanê li Lêlikên li dijî artêşa Tirk a dagirker 9'ê Cotmehê du çalakî kirin.
Navenda Ragihandinê ya HPG'ê diyar kir ku çalakiya pêşî berê sibehê û çalakiya duyan jî berêvarî hatiye kirin û hate gotin, ''derbên serkeftî li kozik û stareyên dijmin hatin xistin''.
Derbarê çalakiyê bi berfirehî wiha hate gotin:
''Bi çarçoweya Pêngava Şoreşger a Şehîd Apîroz û Şehîd Agirî hêzên me yên YJA STAR'ê 9'ê Cotmehê saet 08.30'an li Başûrê Kurdistanê, li Girê Lêlikanê ya Sidekanê li dijî artêşa TC'ê a dagirker çalakî kirin. Di vê çalakiyê de derbên serkeftî li wesayitên dijmin ên li gir hatiye xistin, di encama çalakiyê de ji leşkerên dijmin çend hatine kuştin û çend birîndar bûne, diyar nebûye. Heman rojê saet 17.00'an hêzên me careke dî dagirkerên li Girê Lêlikanê kirine hedefa xwe. Di vê çalakiyê de derbên serkeftî li kozik û stareyên dijmin hatine xistin, di encama çalakiyê de ji leşkerên dijmin çend hatine kuştin û çend birîndar bûne, diyar nebûye.''

## Îranê av li ser Iraqê birrî



Îranê ava li ser Îraqê qût kir. Li Iraqê li hinek bajaran bi kêmbûna avê re pirsgirêk zêdetir bûn.
Rejîma Îranê ya ku pirsgirêka avê li welatê wan heye, ji roja Sêşemê û vir ve avên ber bi Iraqê ve diherikin bi biryarekê rawestandin. Di rawestandina avê re di serî de li bajarê Besra yê Iraqê û gelek bajaran pirsgirêka avê derket û nîşana vê jî bi qirêjiya derdor re derket pêş çavan.
Alîkarê Wezîrê Çandiniyê yê Îranê Elî Mûradî Ekber, diyar kir ku ava li ser fermana Alî Xameyî hatî qûtkirin wê li Îranê di 3 projeyên cuda de bikar bîne. Ava ku bê bidestxistin wê ji 550 metre kup di projeya Huzîstan, 220 metre kup hem ji bo projeya Huzîstan û hem jî ji bo Îlamê bê bikaraîn.
Ekber anî ziman ku sedema qutkirina avê ji bo pêşketina çandiniya li welat û madeyên xwarinê hatiye girtin.
Malpera bi navê Esîr ragihand ku Elî Mûrad Ekber ji bo ji nû ve pêşketina çandiniya li welat buceyeke 8 milyar dolar ji bo Wezareta Enerjî û Çandiniyê hatiye veqetandin.

**LI BESRAYÊ 90 HEZAR KES BI JEHRÊ KETINE**

Li Besra ya dikeve bakurê Welat ji meha Tebaxê ve pirsgirêka ava paqij lê heye. Li gorî Komîsyona Bilind a Mafê Mirovan a Iraqê, ava ku rêveber belav dikin jî tevlî ava qirêj dibe. Herî kêm 90 hezar kes ji ber ava qirêj bi jehrî bûne û rakirine nexweşxaneyan.

## Dadgeha Tirk 7 sal û 6 meh cezayê girtîgehê da nûçegîhana MA'yê



Daraza rejîma Tirk, ji bo nûçegihana Ajansa Mezopotamya Taşkin a nêzî salek e berê hatibû girtin, 7 sal û 6 meh cezayê girtîgehê lê hate birîn.
Rûniştina doza Rojnameger û nûçegîhana Ajansa Mezopotamya Seda Taşkin li Mûşê pêk hat.
Heyeta dadgehê 7 sal û 6 meh ceza li Taşkin birrî. Taşkin di 20'ê Kanûna 2017'an de bi îdîaya "di derbarê wê de îxbar heye" hatibû destgîrkirin. Di 22'ê Çile de Seda Taşkin hatibû girtin û girtî tê darizandin.2'emîn Dadgeha Cezayên Giran a Mûşê li Taşkin 7 sal û 6 meh cezayê girtîgehê birî.

## Li Minbicê 2 bazirganên heşîşê hatin girtin



Hêzên Ewlekariya Hundirîn li bajarê Minbicê 2 bazirganên hebên hişbirê girtin.
Piştî agahiyên derbarê her du bazirganan de hatin, Buroya Têkoşîna li dijî Sûcên Birêxistinkirî ya girêdayî Hêzên Ewlekariya Hundirîn dest bi lêkolîn û şopandina her du bazirganan kir.
Piştî girtina tedbîran, her du bazirgan tevî sed hezar hebên hişbirê hatin girtin.
Rêveberên Buroya Têkoşîna li dijî Sûcên Birêxistinkirî da zanîn ku her du bazirgan li xwe mikur hatin ku wan heb ji bajarê Babê bi rêya stêrên mazotê anîne Minbicê. Her du bazirgan ji komîteya lêpirsînê re hatin şandin da ku ji bo dadgehkirinê werin veguhastin.



## Îsraîl wê êrîşên xwe li Sûriyê dewam bike

Serokwezîrê Îsraîlê Benyamîn Natanyahû diyar kir ku tevî ku Sûriyê çekên S-300 wergirtine jî Îsraîl wê êrîşên xwe li hemberî Îran û Hizbullahê di Sûriyê de berdewam bike.
Serokwezîrê Îsraîlê Benyamîn Natanyahû ji cîgirê serokwezîrê Rûsyayê Maksîm Akîmov re dema ku serdana Qudsê dikir, piştrast kir ku Îsraîl wê dijberiya xwe li hemberî Îran û Hizbullahê di Sûriyê de berdewam bike.
Netenyahû di civîneke çapemeniyê de diyar kir ku wî Akîmov agahdar kiriye ku Îsraîl wê li hemberî hewldanên Îranê yên xwebicihkirina leşkerî di Sûriyê de û li dijî şandina wê ya çekên pêşketî ji Hizbullahê re derkeve.Netenyahû got li ser bingeha xweparastinê Îsraîl wê çalakiyên xwe li dijî Îranê û amûrên wê di Sûriyê de berdewam bike.



# Yekemîn pêşengeha pirtûkan li Amûdê vedibe

**Bajarê Amûdê li Rojavayê Kurdistanê di aliyê xwe yê rewşenbirî tê nas kirin. Ji lewre jî eleqeya ji bo xwendinê li vî bajarî zêde ye. Bi durûşmeya "Ji bo ku em nivîskarên xwe ji bîr nekin" di 13-14'ê vê mehê de pêşengeha pirtûkan tê vekirin.**






Di bin dûrûşmeya "Ji bo ku em nivîskarên xwe ji bîr nekin" yekemîn pêşengeha pirtukxaneya çand û huner li dar dikeve.
Bi armanca bîranîna nivîskarê kurd ê nemîr Tewfîq El-Huseyîn cara yekemîn Pirtukxaneya Navenda Çand û hunera Hurî ya bajarê Amûdê di 13 û 14'ê Cotmehê de pêşengeha pirtûkan li avahiya Navenda Hûrî vedike. Di pêşngehê de berhemên nivîskaran, weşanxane, Yekîtiyên Rewşenbîr û Nivîskarên Herêma Cizîrê wê beşdarî pêşengehê bibin.

**PÊŞNGEH WÊ2 ROJAN VEKIRÎBE**

Pêşengeh wê 13-14'ê mehê vekiribe, ango wê du rojan dewam bike. Rojane wê pêşngeh ji saet 10'ê sibê ta 1'ê piştî nîvro û ji saet 4 ta7'ê êvarî vekirî be.
Di heman demê de di roja yekemîn a pêşngehê de ew ê li ser pêşxistina çandê û xwendinê û rola nivîskaran di civakê nîqaş bikin...*Ronahî*

## Tevî astengiyan jî dev ji wênexêziyê berneda



Şêwekar Ferhad Mistê Hec Mehmûd ji zarokatiya xwe de dest bi şêwekariyê kiriye û ji bo ku bikare vê hunerê pêk bîne, li gelek deveran geriyaye.
Welatiyê bi navê Ferhad Mistê Hec Mehmûd di sala 1970'yan de li bajarê Kobanê hatiye dinê. Wênesaz Ferhad ji ber ku meraqa xwe ji berê ve li şêwekariyê (wênesazî) hebûye, her tim ew wêne çêkiriye.
Şêwekar Ferhad beriya dest bi karê wênexêziyê bike, li akademiyeke li Urdunê beşa telefonan dixwend. Piştre li peymangeha El-Kendî ya bajarê Helebê beşa dînemoyên kehrebeyê dixwîne û bawernameyê ji vê peymangehê werdigre. Ferhad dibêje wî agahî derbarê dîroka wênexêziyê de kom kirin û lêkolîn li ser kirine. Ferhad da zanîn ku divê mirov beriya dest bi karekî bike, dîroka wî karî baş nas bike.
Ferhad da zanîn ku beriya dest bi şêwekariyê bike, ji ber ku rewşa malbata wî ya aborî pirr ne baş bûye bi xwe kar kiriye û di destpêka şêwekariya xwe de tiştên normal çêkirine da ku fêrî şêwekariyê bibe û tabloyên mezin piştre çêkirine.
Ferhad tev lî pêşbirkên li bajarên din bûye û wêneyên balkêş çêkiriye.
Ferhad da zanîn ku di sala 1997`an de di Cejna Newrozê de wêneyên mîna ala kurdan û wêneyên Mazlûm Dogan û Mehsum Korkmaz (Egîd) amade kiriye.
Destpêka ku Ferhad dest bi şêwekariyê kiriye, xwestiye tabloyên Abdullah Ocalan û Ehmedê Xanî, Şêx Seîd û Melayê Cizîrî çêke. Lê ji ber rejîmê nikaribûye navê xwe û dîroka wêneya xwe li ser wêneyê binivîsîne. Lê tevî ku ew qas zehmetî dîtiye dîsa jî dev ji karê xwe bernedaye û karê xwe berdewam kiriye.
Ji ber ku li Kobanê nikaribûne pêşangehekê vekin di sala 1999`an li Helebê Ferhad û 6 hevalên wî yên ji Efrînê pêşangehek vekirine. Heta salekê karê xwe dewam kirine, lê heta sala 2000'î ji ber rewşa aborî û hin sedemên din, dev ji şêwekariyê berdaye.
Di sala 2001`î de ji welat derketiye û berê xwe daye Lubnanê û 2 salan li wir maye û piştre berê xwe daye Hewlêrê. Lê dilê xwe ser şêwekariyê bûye. Vê yekê jî hiştiye ku dîsa vegere Helebê û dest bi şêwekariyê bike û tiştên kevnar çêkirine.
Piştî demekê berê xwe daye başûrê Kurdistanê û piştî ku 3 sal li Hewlêrê derbas kirine, vegeriyaye bajarê xwe û dîsa dest bi karê xwe yê şêwekariyê kiriye.
Ferhad diyar kir ku rejîma Sûriyê ji wî re hin astengî derxistine lê wî dev ji şêwekariyê bernedaye. Ferhad destnîşan kir ku tabloyên wî pirraniya wan têkildarî şer û şoreşê ne û rastiya şerê ku li welat çêbûye, nîşan didin…*ANHA*

## Pêşangeha `Rêbertiya azad wêneyên azad nîşan dide` wê heta 15'ê mehê bidome



Pêşangeha Saziya Çand û Hunerê ya Nuger a ku roja 8'ê cotmehê li Hola Tewar a Silêmaniyê bi dirûşmeya `Rêbertiya azad wêneyên azad nîşan dide` hatî vekirîn li ber Baxê Giştî yê Silêmaniyê berdewam dike. Di pêşangehê de gelek wêneyên Ocalan hene.
Pêşangeha `Rêbertiya azad wêneyên azad nîşan dide` a weneyan ku Saziya Çand û Hunerê ya Nuger organîze dike, li Hola Tewarî ya li Silêmaniyê hate vekirin. Ji bo balê bikişînin ser 20'emîn komploya navneteweyî ya 9'ê Comtehê ya li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li Baxê Giştî yê Silêmaniyê hate vekirin.
Di pêşangehê de wêneyên Ocalan û gelek şehîdên Têkoşîna Azadiya Kurdistanê tên nîşan dan.
Welatî eleqeyek mezin nîşanî pêşangehê didin.
Biryare ku ev pêşangeh heta 15'ê Cotmehê li navçeyên Silêmaniyê berdewam bike…*ROJNEWS*



## Pirsgirêk Çiye?

Rotînda YETKÎNER

Gelek kes dibên, "were em kar bikin, koro çêkin, perwerda muzîkê bidin, xebat çêkin" û hwd. Niha divê em pirsgirêka heyî baş û gelek baş têbighêjin. Pirsgirêk ne karkirina çend kesane û ne jî ne kar kirina çend kesane. Nêrînên ku çêbûne û bi gel jî dane pejirandin ên li hember huner û hunermendên resen, bi hewildana çend kesên dil paqiş û ji xebat heskirî ji holê ranabe.
Em rexneyên gelek giran li kapîtlizmê dikin û dibên, " huner kiriye meta û ji bo berjewendiyên xwe bi kar tîne" ev gelek raste û nêrînek di cîh de ye, lê gelo li hêla me huner ketiye çi rewşê?
Divê li hember hunerê nêrînek wisa bihata afirandin ku, ne tenê stranbêjên welatparêz, ên li dijî Tevgera Azadiyê jî, bixwestana di şev û şahiyên me de derketana ser dikê. Divê şevên Partiyê biba nişaneya hunera herî bi rûmet û hunera resen û her hunermendên xwedî keda resen bixwesta derkeve şev û şahiyên me. Ka em rastiyê binêrin, " heval ka bila çend stranê govendê bêjin bila gel govend bigre. Ka bila tembûra xwe bigre were. Heval gel govend dixwaze, stranê te ên govendê tune." Û heya dawî erzan nêzikbuyîna li hember hunêre heye. Tu diçî şev an şahiyên surprîz ên gelek mezin dertên pêşiya te. Sazbendek tînîn ku bila ji tere saz lêde, hey medet akor kirina temburê nizane wê çawa stranên te bizane. Dawiya şevê tê û tu bi hestên dil şikestî, ser dika sar û guhdarên ku hîç xema xwe bi te nanîne dêşe. Deng xweşikbûyîn, stranên giranbuha, an jî keda te a resen hîç kimya wî tune, ger te ji bo govend stran negotibe, tu ne stranbêjî. Belê li hêla me muzîk hatiye vî halî.
Bi salane di civîn û konferansan de me got û got û dawî çiye rewşa me?
Akademî dawazbû; li holê cihek nemaye ku em bikaribin bên gel hev û biaxfin.
Konserê mezin û bi bandor daxwazbû; nema li hole du stranê paqiş û bi awayek hunerî gotin.
Koro, dibistan, perwerda zarokan gotin; li holê nemaye yek şagirtekê dil soz.
Niha kî mikrofonê digre destê xwe naxwaze dayne û çi distêre, rast an ne rast diqîje û dibe "çepik" û çepik. Rewşa stranbêjên heyî hat ve halî.
Yanî mesele ne ku, "ka heval werin em bicivin û biryaran bigrin" ne. Pirsgirek ev nerînên ku ji bo karên rojane pêk were hatine avakirin, huner qedandiye.
Tu, kesên ku tenê sitranek dibê û bi tesadufî buye stranbêj û kesên ku temenê xwe ji bo hunera resen feda kiriye bikî wek hev û di heman çerçewê de lê binêrî, wê ev rewşa têkçûyî neguhere. Divê TU XWE BIGUHERÎNÎ. Biryar bidî ka tu huner dixwazî an ji bo govêndên bi çoş û dawî puç û bi sloganên erzan stran gotinan?
Em bîr nekin ku şoreşa herî bi bandor û dijwar, perwerde kirina civaka pêşverê ye û rêya wî jî hunera resen e. An jî ez wisa difikirim, ger şaşbe lêborîn, lê mixabin ne şaş e.

# Peykerê Kawayê Hesinkar hat danîn

**Çeteyên DAIŞ û yên dewleta Tirk dema ku Efrîn dagirkirin, li Efrînê peykerê Kawayê Hesinkar hilweşandin. Vê êrîşê rê li ber nerazîbûna hemû Kurdan vekir. Welatiyên Derbendîxan a bi ser Silêmaniyê ve jî li hemberî kiryarên dewleta Tirk û çeteyên DAIŞ peykerê Kawayê Hesinkar li navenda sûkê danîn.**

Çeteyên DAIŞ û yên dewleta Tirk li Efrînê peykerê Kawayê Hesinkar hilweşandibûn, welatiyên Derbendîxan jî li hemberî kiryarên dewleta Tirk û çeteyên DAIŞ peykerê Kawayê Hesinkar li navenda bazarê danîn.
Li bajarokê Derbendîxan a ser bi bajarê Silêmaniyê ve bi merasîmekê peykerê Kawayê Hêsinkar hat danîn. Armanca danîna peyker şermezarkirina kiryarên dewleta Tirk yên li Efrînê bû. Dewleta Tirk û çeteyên DAIŞ di ketina Efrînê dest bi talan kirina dîroka kevnar ya bajêr kiribûn. Hêjî ev kiryar berdewam dikin.
Peykerê Kawayê Hesinkar li navenda bazara bajarokê Derbendîxan hat danîn. Peyker ji aliyê peykersaz Zîrek Mîre ve hat çêkirin. Peyker ji aliyê welatiyan ve hat danîn û rastî eleqeyek mezin ya welatiyên bajarokê Derbendîxan hat…*ROJNEWS*




## Welatî dibistana gundê xwe sererast kirin

Şêniyên gundê El-Sewa yê Dêrazorê bi insiyatîfa xwe ji bo ku zarok di sala perwerdê ya nû de bixwînin, dibistana gund sererast kirin. Lê dîsa jî hewcedariya dibistanê bi kursîyên rûniştinê heye.
Şêniyên gundê El-Sewa yê rojavayê Dêrazorê bi insiyatîfa xwe û di nav hev de pereyên pêwîst ji bo sererastkirina dibistana gund kom kirin. Sêniyan dibistan sererastkirin û boyax kirin. Piştî bidawîbûna xebatê, zarokan berê xwe dan dibistanê.
Lê dibistan bi hewcedariya kursiyan e. Ji ber wê Komîteya Perwerde û Fêrkirinê ya Meclisa Sivîl a Dêrazorê wê kursiyan ji dibistanê re peyde bike.
Welatiyê bi navê Zekeriya El-Esaf ê ji şêniyên gundê El-Sewayê ye û xebatên sererastkirina dibistanê dişopîne got: "Me xebat li dibistana El-Sewa rojava bi dawî kir û zarok çûn dibistanê. Ev dibistana duyem e ku em amade dikin."
Çeteyên DAIŞ'ê hejmarek dibistanên gundewarên rojhilat û rojavayê Dêrazorê talan û wêran kiribûn…*ANHA*




## 3 hezar û 550 erebe hatine tomarkirin



Buroya Veguhastinê ya girêdayî Meclisa Sivîl a Reqayê heta niha 3 hezar û 550 erebe qeyd kirine. Her wiha wê dest bi qeydkirina motosîkletan jî bike.
Buroya Veguhastinê ya Reqayê di 26`ê Îlonê de hate avakirin. Meclisa Sivîl a Reqayê buroyeke fermî ya veguhastinê vekir da ku li ser kaxizên erebeyan û dayîna tabloyên erebeyan bixebite. Komîteya Trafîk, Keşf û Veguhastinê û Hêzên Ewlekariya Hundirîn karê keşfa erebeyan dikin.
Kesên ku temenê wan zêdetirî 18 saliyê be dikarin erebeyan biajon û rûxseta ajotinê bigirin. Piştî ku ezmûn tê çêkirin û ajokar ezmûna xwe baş derbas dikin, ruxseta ajotina erebeyan digirin.
Komîteya Veguhastinê erebeyên ji derve li gorî resmên gumrikê qeyd dike û li gorî erebeyê tabloyê dide.
Ji bo erebeyên mezin 3 hezar, yên navin jî 2 hezar û yên biçûk hezar lîreyên Sûriyê ji Rêveberiya Gumrikê re têne dayîn.
Ji rêveberên Buroya Veguhastinê ya Reqayê Îsmaîl Ehmed diyar kir ji destpêka buro hate vekirin ve wan deriyê qeydikirina erebeyan vekir. Ehmed diyar kir ku heta niha 3 hezar û 550 erebe ji hemû cureyan hatine qeydkirin û wê dest bi qeydkirina motosîklêtan jî bikin…*ANHA*

## Şaredariya Gel a Dêrikê rêyeke nû çêkir

Şaredariya Gel a bajarê Dêrikê li Taxa Şehîd Xebat rêyeke nû bi dirêjehiya 250 metre û firehiya 12 metre vekir da ku tevgera di nava taxê de hêsantir bibe. Di demên berê de li Taxa Şehîd Xebat binesazî bê ser û ber bû, ji ber wê şaredariya gel di çarçoveya projeyên sala 2018`an de wê li gorî derfetên xwe xizmetên ji bo taxê berfireh bike.
Şaredariyê di destpêkê de rêyeke nû di taxê de vekir da ku tevger li taxê hêsantir bibe. Endama Buroya Fenî ya Şaredariya Gel Lîna Xelîl diyar kir wan ew rê li taxê vekir û her wiha wê xebatên xwe ji bo sererastkirina binesaziyê zêdetir bikin. Şaredarî wê bingeha kolanên xirabûyî li taxên Cûdî, Sor, Şehîd Xebat û Rojava deyne… *ANHA*



## Navenda pembû ya El-Çelebiyê pembû digire



Navenda Pembû ya El-Çelebiyê ji destpêka vekirinê de derdora hezar ton pembû pêşwazî kiriye. Li gorî rêveberiyê ev rêje li gorî qadên ku hatine çandin kêm e.
Navenda pembû ya El-Çelebiyê navenda tekane li Herêma Firatê ye. Di 25'ê meha Îlona îsal de li herêmek di navbera Kobanê, Eyn Îsa û Girê Spî ji bo pêşwazîkirina pembû hate vekirin.
Navend rojane nêzî 80 ton pembû pêşwazî dike. Heta niha navendê di 13 rojan de derdora hezar ton pembû pêşwazî kiriye. Rêveberên navendê dibêjin ku li gorî qadên ku bi pembû hatine çandin ev rêje kêm e…*ANHA*

## EWROJ



### Komkujiya Enqerê

Farûk SAKIK

Êvara 7ê Hezîrana sala 2015an de dema ku ji ajansa encamê hilbijartinan eşkere bûn di heman demê de têkçûna desthilatdariya AKPê ya 12 salan jî eşkere dibû.
Li hember vê têkçûnê AKPê, biryara şer da û ji bo ku hilbijartin werin dubare kirin 1ê Mijdarê destnîşan kir.
Di atmosferek waha de, di cotmehê de, ev blog ji bo dawî li vî şerî bînin, ji bo aştiyek mayende di nav hewldanan de bûn. Û biryardan ku di 10ê Cotmehê de li Enqerê mitîngek girseyî lidarbixin. Dest bi amedekariyan kirin.
Di serî de HDP û ev hêzên aştîxwaz ji PKKê xwestin ku agirbest îlan bike. PKK her çiqas di agirbestek dualîde bi israrbû jî dîsa hetanî yekê Mijdarê biryara agirbestek yek alî da. Ev yek jî ewê di 10 mehê de di mitînga Aştiyê de li Enqerê denklere bikira.
EWROJ.....
Di 10ê Cotmehê de ji her deverên Tirkiyê di bin pêşengiya, Konfederasyona Sendîkayên Kedkarên Gelemperî (KESK), Yekîtiya Bijîşkên Tirk (TTB), Yekîtiya Odeya Mîmar û Mihendisên Tirkiyê(TMMOB), Konfederasyona Sendîkayên Karkirên Şoreşger(DÎSK),Partiya Demokratîk a Gel (HDP) û mirovên aşitîxwaz berbi Enqerê ve diherikîn.
Kesên ku hatin li hin noqteyêan komdibûn û berbi qada mitîngê ya "Pira Sihhiye" ve ewê bimeşiyan.
Ji van noqteyan yek jî ber "Gara Trênê" bû.
Hatin bi pankart û flamayan, bi qêrîn û sloganan.
Hatin, di dest, dil û li ser zimanê wan peyamên aştî, biratî, demokrasî û mirovahiyê hebûn.
Hatin, Govend gerandin û stran gotin.
Saet 10:05an de bi dengê 2 teqînan govend û stranên wan yên aşitiyê di nîvcu de man.
Teqîna yekem li cihê kortêja girseya HDPê û duyem jî di kortêja EMEP û SGDFê hatibû teqandin. Û li paytextê Tirkiyê li navenda demokrasiyê ew roj komkujî hebû.
Di bombeyan de parçeyên metal û bîlye bikaranîbûn.
Her deverî cesed û parçeyên laşê mirovan hebûn.
Cîhê komkujiyê veguherîbû gola xûnê.
Qêrîn, hawar û dengê sîrênên anbulansa tevlî nav hev dibû.
Piştî teqînê dîmen û tabloya ku derket holê xwîna mirovan di cemidand.
Pankartên ku çalakger li ser aştî nivîsandibûn bûn kefen.
Ji bo birîndaran jî ti mudaxele nehat kirin.
Gel li qadê bi derfetên xwe birîndarên xwe rakirin.
Herçiqas gel bi qêrîn û hawar gotin ambûlans jî; Hêzên dewleta Tirk demeke dirêj nehiştin ambûlans herin cîhê bûyerê û di ser de jî bi ava şidiya û bombeyên gazê êrişî gel kirin.
Gel, birîndaran bi wesaîtên şexsî rakirin nexweşxaneyan.Û gelekî kesan, yeko yek alên HDP'ê yên li ser miriyan radikirin û li xizmên xwe digeriyan. Çalakgerên li cîhê bûyerê jî nerazîbûneke tund nîşanî polîsan didan.
Polîsên ku hatin cîhê bûyerê jî gulle li ser gel reşandin.Gelek çalakger jî ji aliyê Polîsan ve hatin binçavkirin.
Dayîkên ku ji bo aştiyê hatibûn li ser zarokên xwe dilorandin.Dema ku dayîk dilorandin, li aliyê din çalakger hewildidan hêzên dewletê ji qadê dûr bixin da ku birîndaran rakin nexweşxaneyan.
Piştî ku çalakgeran Polîs ji wir dûr xistin ambûlans ketin qadê û birîndar rakirin nexweşxaneyan.Cenaze hatin komkirin û birin "tipa edlî". Birîndar gelekbûn, wan jî li hemû nexweşxaneyên Enqerê belav kirin.Kaos hebû herkes li xizmê xwe digeriyan.
Li berderiyê nexweşxaneyan û "Tipa Edlî" lîsteya mirî û birîndara hebû. Gel bi hêrs bû.
Hevseroka HDPê Fîgen Yuksekdag jî li ber deriyê nexweşxanê bû û êşa malbatan parvedikir.
Evarê di bultenan de hejmara kesên ku jiyana xwe jidestdane û birîndara hat eşkere kirin. Ev hejmar hevdû nedigirtin. Roj derbasbûn hat eşkere kirin ku di vê komkujiyê de 107 kesî jiyana xwe ji dest dayî û di ser 500 de jî birîndar henin.
ÎROJ...
Di germahiya komkujiyê de, rayedarên dewletê û AKPê bi daxwiyniyên xwe dixwestin ser vê komkujiyê bigirin. Dixwestin esas hedef berevajî bikin. Dixwestin ku sûcê xwe yê di vê komkujiyê de veşêrin anjî bavêjin sutiyên hin kesên dinan.
Di Hezîrana sala 2016an de îdanemaya doza komkujiyê ya ku ji 571 rûpelî pêkdihat hat dadgeha çaremîn ya cezayê giran. 36 bersuc hebûn di dozê de. Dadgehê di derheq 17 kesan de biryara bêteqibiyê da.



# Divê jin li dora yek maseyê rûnin

**Li bajarê Elmanyayê Frankfurtê Yekemîn Konferansa Navneteweyî ya Jinan 6-7´ê Cotmehê bi beşdariya 500 jinên ji seranserê cîhanê hate lidarxistin. Jinên ku beşdarî konferansê bûn diyar kirin ku konferansê tesîreke mezin li wan kiriye. Jinan destnîşan kirin ku divê konferansên bi vî rengî dewam bikin, jin bên cem hev û li daro yek maseyê rûnin.**

Li bajarê Elmanyayê Frankfurtê Yekemîn Konferansa Navneteweyî ya Jinan a "Şoreş niha dibe" a bi organîzasyona tora bi navê "Women weaving the future (Jin siberojê dihûnin)" 6-7´ê Cotmehê bi beşdariya 500 jinên ji seranserê dinyayê hate lidarxistin.
Di konferansê de jinan tecrûbeyên ji gelek welatên dinyayê anîn cem hev, gotubêj kirin û nexasim jî bala xwe dan Şoreşa Rojava û Şoreşa Jinê ya di nava tevgera azadiya Kurd de.
Ji Welatê Baskê, heta bi Îtalya û Elmanyayê tesîra konferansê hem heyecan di jinan de çêkiriye û hem jî ji wan re bûye hêviya serketinê û hûnandina siberojê. Jinên ku tevlî konferansê bûn nêrînên xwe anîn ziman.
**Nerea ji Welatê Baskê**: Ez di vê konferansê de beşdarî komxebata Kolonyalîzm û Bandora wê li Jinan bûm. Gelekî tesîrker bû, ji ber ku pêşî jineke Efxan peyivî, paşê jineke ji Sûdanê, û di dawiyê de dayikeke ji Şengalê û dayikeke ji Efrîn peyivîn. Dayika ji Şengalê zêmarek got. Ya rastî me ji ziman tiştek fêm nedikir, lê her yek ji me li wir giriya. Mirovahî tiştekî ji zimên û wê de ye. Me bi Kurdî nedizanî helbet, lê me ji hest û dilê wê fêm kir. Dema min li wê dihisand, mirovên ku bi êş û azara ji destdana mirovan dinaliyan hatin bîra min. Tevgera Kurd dikare hêza siyasî bide jinên navsere jî û ev mînakek e ji bo hemû jinan. Ez naxwazim bibim çepgireke sekter û ez bi rastî hez ji miletê Kurd dikim, li vir dixwazim bibêjim em gelekî feyzê digirin ji tevgera Kurdan. Ew ji me re çavkaniya îlhamê ne.
**Parîzîna ji Îtalyayê**: Ez ji bajarê Îtalyayê Mîlanoyê têm. Rûniştina sibehê gelekî xurt bû. Hêzeke konsantre hebû. Ew qasî kelacanî bûm, hindik mabû ku ez bigirîm. Ew merasîma tevî jinên ji Honduras, ji Kurdistanê, ji Meksîka Çiyapasê, ev tecrûbeyeke çi bedew bû, çi xweşik bû. Ez malavahiya li hemû jinên Kurd û miletê Kurd dikim ku ev konferans pêk anîn û kirin ku em jin hev bibînin.
**Julia ji Elmanyayê**: Ez ji Berlînê têm. Ez bi konferansê hisiyam, ji ber ku ez di Komîteya Efrînê de cih digirim ku li dijî êrişên li dijî Efrînê hat damezirandin. Bi rêya wê komîteyê bi rêk û pêk di navbera çepgirên Elman û tevgera Kurd de danûstandineke misêwa heye. Ji bo me girîng e em vê berfireh bikin û bikin civakek. Ji hingê ve ez bêhtir elaqedarî tevgera Kurd im û elaqeya min gelek e ji Konfederalîzma Demokratîk re, ji Jineolojiyê re. Beriya du hefteyan ez li wê konferansa dawiya hefteyê ya Jineolojiyê jî bûm.
**Taira ji Berlînê**: Ez li Berlînê tevî Meclisa Jinan a Kurd dixebitim. Ji ber wê yekê jî qismî di amadekariyan de jî min cih girt. Rûniştina yekem û merasîmê gelek tesîreke erênî kir. Nexasim jî ew hêza sembolê ya jinên ji welatên cihê li ser dikê. Ango mirov didît ku bi awayekî gerdûnî, têkoşîn li her deverê heman têkoşîn e. Vê gelek hêz da. Ji ber ku li her deverê mijarên me yek in. Ya ku divê em bikin ew e ku em bên cem hev li dora heman maseyê rûnin û vê hêza hanê bi hev re bihûnin, bikin yek. Bi ya min lazim e konferansa û çalakiyên bi vî rengî dewam bikin. Û ne tenê li Elmanyayê, li deverên din jî ku li wan têkoşîn hîna ji ya li vir zehmetir e jî. Weke jin em herin wir jî û li wir jî mînakeke nîşan bidin.













## Hêviya me heye em ê rojekê vegerin Efrînê

Jinên Efrînê yên ku li herêma Şehbayê bi cih bûne û ji bo debara jiyana xwe bikin têkoşîna aboriyê didin û gotin: "Em serê xwe li ber dagirkeran natewînin."
Jinên Herêma Efrînê yên ku li Navçeya Tel Rifetê ya Şehbayê bi cih bûne û ji bo debara jiyana xwe bikin têkoşîna aboriyê didin. Jinan diyar kirin ku ti hêz nikare îradeya wan têk bibe û wiha gotin, "me heta niha li dijî dagirkeriya dewleta tirk û çeteyên girêdayî wê li berxwe da û em ê berxwedana xwe bidomînin. Em di heman demê de têkoşîna aboriyê didin da ku pêdiya me ji tu kesî nemîne û em li ser lingên xwe bimînin."





### EM Ê ROJEKÊ VEGERIN EFRÎNÊ

Jina bi navê Eyşê Bekir a 40 salî ku dayika 4 zarokane û ji gundê Çeqela ya girêdayî navçeyê Şiyê ye got: "Dema ku dewleta dagirker a tirk û çeteyên wê êrîşî gundê me kir em tevî zarokên xwe çûn di şikeftan de man. Gelek zarok bûn qurbanê top û çekên dewleta tirk. Di 16'ê meha adarê em ji Efrînê derketin, ew roj weke xeyalan li ber çavên me derbas dibûn. Bi sed hezaran kes li kolanên Efrînê bûn û nedizanîn wê bi ku de biçin. Di dawiyê de me berê xwe da Şehbayê ji ber ku nêzî Efrînê bû. Li Şehbayê ji ber ku derfet kêm in, hemû pêdiviyên me pêk nayên, ji bo em aboriya xwe xurt bikin û debara malbata xwe bikin me dikanek biçûk vekir. Niha em ji bo li ser lingên xwe bisekinin em têdikoşin. Em naxwazin destên xwe li ber tu kesî vekin. Em hêviya xwe ya vegerandina Efrînê jî tu carî winda nakin. Em di wê baweriyê de ne ku em ê rojekê vegerin Efrînê."

### EM SERÎ LI BER DAGIRKERAN NATEWÎNIN

Jina bi navê Hindirîn Mustefa ya ji navçeya Şerayê ye û dayika 4 zarokan e got: "Erdogan dilê gelek dayikan şewitand. Em tu carî vê yekê ji bîr nakin û em ê têkoşîna xwe bidomînin. Dema ku em li Şehbayê bi cih bûn em 5-6 malbat bi hev re di bin şertên dijwar de dijiyan. Niha em tevî şertên dijwar têkoşîna jiyanê didin û debara xwe dikin. Em serê xwe li ber dagirkeran natewînin û ji bo aboriya xwe geş bikin em têdikoşin. Tu hêz nikare îradeya me têk bibe. Me heta niha li dijî dagirkeriya dewleta tirk û çeteyên girêdayî wê li berxwe da û em ê berxwedana xwe bidomînin. Em di heman demê de têkoşîna aboriyê didin da ku pêdiviya me ji tu kesî nemîne û em li ser lingên xwe bimînin."…
*JINNEWS*

## Rêber Apo rûmeta me ye, em ê lê xwedî derkevin



Jinên Ereb di derbarê tecrîda giran a li ser Rêber Ocalan de gotin: "Tu kes nikare raman û vîna azad tecrîd bike. Di şexsê Rêber Apo de nirxên mirovahiyê jî tên tecrîdkirin."
Jinên Ereb ên Meclîsa Jinê ya Partiya Yekîtiya Demokrat (PYD) a navçeya Girkê Legê di derbarê tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de da zanîn ku Ocalan xwedî fikrên azad û demokratîk e û gotin: "Yên ku tecrîda giran pêk tînin di heman demê de li dijî demokrasiyê tev digerin."
Endama Meclîsa Jinê PYD'ê Sefaa Al Hemîd got: "Dema ku em li dîroka dewleta tirk dinêrin her cure komkujî heye. Her dem gelê din di bin zilmê de hatiye hiştin. Loma dewleta tirk naxwaze aştî çê bibe. Dewleta faşîst a tirk dixwaze hemû gelên Rojhilata Navîn ji fikrên Rêber Apo dûr bixe. Em ê li dijî vê faşîzmê li berxwe bidin. Rêber Apo rûmeta me ye û em ê li rûmeta xwe xwedî derkevin."
Endama Meclîsa Jinê ya PYD'ê Buşra Husên jî derbarê tecrîda giran a li ser Rêber Ocalan de wiha got: "Rêber Apo ji bo aştiya cîhanê û ji bo parastina mafên jinê gelek xebat daye meşandin. Ji ber ku ev xebat ji bo hemû jinên cîhanê hatiye kirin, lewma jî em ê felsefeya Rêber Apo belav bikin. Em dixwazin bi Rêberê xwe re azad bijîn. Divê ev tecrîda giran demildest bi dawî bibe. Tu kes nikare raman û vîna azad tecrîd bike. Ne tenê Rêber Apo di heman demê de nirxên mirovahiyê jî tên tecrîdkirin. Yên ku tecrîda giran pêk tînin di heman demê de li dijî demokrasiyê tev digerin."…*JINNEWS*

# AKP, Tirkiyê bi awayekî çetewarî birêve dibe

**Hevserokê KCD'ê Berdan Ozturk, destnîşan kir ku AKP Tirkiyê bi rêbazên "çetewarî" bi rê ve dibe û got, "pirgsirêka Kurd bi rêyên siyaseta demokratîk û muzakereyê wê çareser bibe. 40 sal in şer dewam dike. Dewlet di vî şerî de hemû qirêjiyên xwe xistin dewrê, lê encam negirt."**

Hevserokê KCD'ê Berdan Ozturk destnîşan kir ku AKP Tirkiyê bi rêbazên "çetewarî" bi rê ve dibe û got: "Bêyî muzakereyê çareserkirina pirsgirêka kurd ne mimkun e. Wê israra me ya di siyaseta demokratîk de heta dawiyê dewam bike."
Di serî de Amedê li 9 bajarên Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê rojnamevan û siyasetmedar jî di nav de zêdetirî 100 kes hatin binçavkirin. Di çarçoveya vê operasyonê de 7 endamên Dîwana Hevserokatiya Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) jî hatin binçavkirin.
Hevserokê KCD'ê Berdan Ozturk bertek nîşanî vê yekê da û got: "Bi rêbazên çetewarî welat îdare dikin. Bi gefxwarin, şantaj, polîs û leşkeran hewl didin welat bi rê ve bibin."
Ozturk, diyar kir ku ev operasyon ne nû ne, demeke dirêj e tên kirin û da zanîn ku bi taybet jî bi van oprasyonan tê xwestin ku KCD'ê îllegalîze bikin û got: "Rêvberiya faşîst a AKP-MHP'ê dixwazin bi vî awayî vîna kurd ji holê rabikin."



Ozturk bal kişand ser gotinên Erdogan ku ji bo şaredariyan gotibû, "Eger bi ser bikevin jî em ê qeyûm tayîn bikin" û got: "Piştî van gefên Erdogan ev operasyon hatin kirin. Armanc ew e ku îradeyê bişikînin. 3 sal in ji bo vê tev digerin. Lê tevî hemû çewisandin û zextan jî nikarin vê îradeyê bişikînin. A rast îradeya wan şikiyaye û qediyan e. Ev yek bi awayekî zelal ji gefên wan dixuyê. Nikarin tu tiştekî bi pêş ve bibin. Tenê bi tiştekî dizanin ew jî zimanê gefxwarinê."
Ozturk bal kişand ser hilbijartinên wê di Adara 2019'an de pêk bên û got: "Bi van operasyonan dixwazin bitirsînin û bitepisînin. Hilbijartinên herêmî ji bo me pir girîng in. Dema em li hilbijartinên 1'ê Mijdar, 7'ê Hezîran û 24'ê Hezîranê dinerin, em dibînin ku îradeya gelê me li cihê xwe ye. Gelê me xwedî biryar e û wê li ber xwe bide." Ozturk, destnîşan kir ku piştî her gotinên erdogan hêzên dewletê li hemberî kesan û partiyan operasyonan dikin û got: "Hemû gotinên Erdogan wekî fermanê tên fêmkirin. Erdogan kî hedef nîşan bide li hemberî wan operasyon pêk tên. Ev rewş bi awayekî eşkere gefxwarin e û ferman e."

### BI RÊBAZÊN ÇETEWARÎ WELAT BI RÊ VE DIBIN

Ozturk, destnîşan kir ku tevî hemû zext û zoriyan û polîtîkayên tepisandinê jî wê HDP têkeve hilbijartinên herêmî û got: "wê ev operasyon bi ti awayî tesîrê li HDP'ê neke û wê HDP têkeve hilbijartinên herêmî. Di hilbijartinên din de jî astengî hebûn, lê gelê me di sindoqan de îradeya xwe nîşan da. Bi rêbazên çetewarî vî welatî bi rê ve dibin. Bi gefxwarin, şantaj, polîs û leşkeran hewl didin welat bi rê ve bibin. Ev rewş tê wateya qedandinê."
Ozturk, anî ziman ku pirgsirêka kurd bi rêyên siyaseta demokratîk û muzakereyê wê çareser bibe û got: "40 sal in şer dewam dike. Dewlet di vî şerî de hemû qirêjiyên xwe xistin dewrê, lê encam negirt. Mirov dimirin. Tenê ne kurd, hemû Tirkiye bedêlê dide." Ozturk bal kişand tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan jî û got: "Ev tecrîd bi hemû gelên Tirkiyê dide windakirin. Tu fêdeya vê tecrîdê ne li Tirkiyê ne jî li gelan heye. Niha gelên Tirkiyê hemû tên tecrîdkirin. Em baş dizanin taliyê wê pirsgirêka kurd bi muzakereyê çareser bibe. Bêyî muzakereyê çareserkirina pirsgirêka kurd ne mimkun e. Wê israra me ya di siyaseta demokratîk de heta dawiyê dewam bike."…*MA*

# Gel wê bi fikrên Ocalan têkoşîna xwe bilind bikin

Ji rûspiyên êlên Tirbespiyê Hisên El-Sade destnîşan kir ku Komploya Navdewletî ne tenê Ocalan û gelê Kurd, hemû pêkhateyên Kurdistanê û herêmê hedef girt.
Nerazîbûnên li dijî tecrîda li Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan berdewam dikin. Rûspiyê êla Benî Sebai ya navçeya Tirbespiyê Hisên El-Sade destnîşan kir ku komploya 9'ê Cotmehê a li dijî Ocalan li dijî hemû gelên ku azadî û mafên xwe dixwezin hatiye kirin.
Hisên diyar kir ku ew nêzî 30 sale fikra Ocalan nas dike û diyar kir çareseriya hemû pirsgirêkên rojhilatanavîn di fikrên Ocalan de derbas dibe. Hêzên serdest yên ku nexwestin ev yek pêk were lewra li dijî Ocalan komplo pêk anîn.
Hisên El-Sade da zanîn ku wî herdem dixwest Ocalan bibîne û wiha dewam kir, "Ocalan di encama kompoloyekê de ji Sûriyê derket. Ev komplo ne tenê li dijî Ocalan, li dijî hemû gelên herêmê hat kirin. ji ber komplogeran dîtin gelên herêmê xwe li fikrên Ocalan digirin û ev yek jî ji bo xwe weke xetere dîtin."



Hisên destnîşan kir ku di encama têkoşîna Ocalan û têkoşîna gelan de komplo hat şikandin û got, "Niha jî gelên herêmê li ser bingeha fikrên Ocalan di nava têkoşîna azadiyê de ne û wê têkoşîna xwe berdewam bikin."
Rûspiyê êla Benî Sebaî Hisên El Sade di dawiya axaftina xwe de diyar kir dewleta Tirk bi piştgiriya dewletên herêmî û navnetewî tecrîdeke giran daniya ser Rêber Ocalan û wiha got, "Hewl didin bi vê tecrîdê hêviyên gelên herêmê yên azadiyê têk bibin. Lê gelên herêmê wê li ser rêya Ocalan bimeşin û têkoşîna xwe berdewam bikin."…*ANHA*

# Partiya Yekitiya Suryan şehîdên Beyth Nehreynê bi bîr anî

Partiya Yekitiya Suryan şehîdên Meclisa Netewî ya Beyth Nehreyn bi bîr anî. Her wiha tekez kir ku ew ê heta dawiyê şopdarên rêya şehîdan bin.
Partiya Yekitiya Suryan bi daxuyaniyekê şehîdên Meclisa Neteweyî ya Beyth Nehreyn bi bîr anî.
Di daxuyaniyê de hate destnîşankirin ku ji bo axa welat ji zilma terorîstan û dijminên mirovahiyê were paqijkirin û ji bo ku gelê herêmê bi azadî û ewlehî bijî, şehîdan canê xwe feda kir.
Partiya Yekitiya Suryan di daxuyaniya xwe de soza şopandina rêya hemû şehîdan da û tekez kir ku wê têkoşîna xwe berdewam bikin.

# NPG'ê, ji ber çalakiya wan gerîlayên Batmanê pîroz kir



Fermandariya Biryargeha Navendî ya Parastina Gel gerîlayên ku roja 4'ê Cotmehê bi armanca şermezarkirina Komploya 9'ê Cotmehê çalakî kirin, pîroz kir.
Fermandariya Biryargeha Navendî ya Parastina Gel (NPG) bi daxuyaniyeke nivîskî gerîlayên qada Botanê ji ber çalakiya 4'ê Cotmehê pîroz kir.
Daxuyaniya Fermandariya Biryargeha Navendî ya Parastina Gel wiha ye;
"Hêzên Gabarê ku li qada Botanê bi çalakiya sabotajê ya li ser rêya gundên Çêlik û Botîka ya 4'ê Cotmeha 2018'an derbeke girîng li hêzên mêtîger ên Tirk xistin, ku van hêzên mêtinger welatême dagir kirine.
Yek ji taktîkên demê taktîka sabotajê bi şêweyekî pêşketî li dar xistin û li ser bingehê pêkanîna vê çalakiyê em di şexsê fermandariya we de hemû hêzên qadê pîroz dikin. Bi taybet ji bo şermezarkirina Komploya 9'ê Cotmehê bi çalakiyek wiha em we hemû şervan û fermandarên ku keda wan di vê çalakiyê de hene pîroz dikin û berdewamiya sekeftinê diwazin. Bi dil û cwan bi coşa şoreşgeriyê em we silav dikin.
Dewleta Tirk a ku heta niha gelek çalakî ji çapemenî û raya gitşî veşartî û bi tu awayî nedayî diyarkirin li dijî vê çalakiya ku hatî kirin mat maye û neçar maye ku çalakiyê di çapemeniyê de biweşîne. Tê fêhm kirin ku hêzên ku çalakî pêk anîne, şêwazeke rast bi kar anîne.
Ji ber vê sedemê jî em wan pîroz dikin û hemû hêzên li qadê bi hezkirin û hurmet silav dikin û hêviya serkeftinên mezin dikin."

# Polîtîkaya Erdogan û AKP'ê bi ser nakeve

Parlamenterê HDP'ê yê Amedê Dr. Selçûk Mizrakli, binçavkirina siyasetmedar û rojnamegeran şermezar kir û diyar kir ku ji ber nikarin Sûrên bajarên herêmê yên ku mirovan bi dil, beden û hêviyên xwe parastine, derbas bikin dîn û har dibin.



Bi fermana Serdozgeriya Komarê ya Amedê, duh li 9 bajarên ku navenda wê Amed bû operasyona siyasî pêk hat. Di operasyonê de rojnameger û siyasetmedarên kurd jî di nav de zêdeyî 100 kesan hatin binçavkirin.
Parlamenterê HDP'ê yê Amedê Selçuk Mızrakli, bertek nîşanî helwesta Erdogan û AKP'ê da û diyar kir ku ev polîtîkaya wan bi ser nakeve. Mizrakli, binçavkirina siyasetmedar û rojnamegeran şermezar kir û diyar kir ku ji ber nikarin Sûrên bajarên herêmê yên ku mirovan bi dil, beden û hêviyên xwe parastine, derbas bikin dîn û har dibin. Li bajarên herêmê mirovan bi dil, beden û heviyên xwe sûr ava kirine. Ev Sûrên hatine avakirin ji aliyê sedhezaran kesên ku dilê xwe dane aştî, azadî, edalet û demokrasiyê ve hatiye avakirin. Yên ku nikarin van Sûran derbas bikin dîn û har dibin. Ji ber ku HDP'ê bend derbas kiriye AKP bêtir bêzar dibe. Di rapora Meclîsa Parlamenteran a Komîsyona Ewropa ya der barê hilbijartina 24'ê Hezîranê de hat diyar kirin ku hilbijartina 24'ê Hezîranê di şertên ne adîl de pêk hatiye. Di raporê de hat zanîn ku AKP'ê hemû derfetên dewletê xistine xizmeta xwe. Lê ligel ne şertên adîl jî dîsa HDP'ê bend derbas kiriye û vê yekê AKP bi awayekî pir cîddî bêzar kiriye. Erdogan di axaftina Kizilcahamamê de diyar kir ku dê vîna gel nas neke. Polîtîkayên AKP û Erdogan ji bo Tirkiye bêxer û bê şensiyek mezin e. Ji niha de dixwaze vîna gel ji destê gel bistîne û heviyên gel bişkîne."



# Emê Minbicê ji êrîşan biparêzin

**Dewleta Tirk a dagirker ji bo ku tedbîrên xwe yên parastinê digire gefan li Minbicê dixwe. Cîgirê Fermandarê Giştî yê Meclîsa Leşkerî a Minbicê Ebû Elî Necim diyar ku mafê wane ku tedbîrên xwe yên parastinê bigirin. Ebû Elî got, "Me Minbic bi xwîna sedan şehîdan rizgarkiriye. Em ê Minbicê ji hemû êrîşan biparêzin"**

Cigirê Fermandarê Giştî yê Meclisa Leşkerî ya Minbicê Ebû Elî Necim diyar kir ew ê Minbicê ji hemû êrîşan biparêzin.
Dewleta Tirk a dagirker hewl dide dîsa Minbicê bixe rojevê û ji bo vê jî gefan dixwe.
Cigirê Fermandarê Giştî yê Meclisa Leşkerî ya Minbicê Ebû Elî Necim destnîşan kir ku gefên dewleta Tirk ên li ser Minbicê dubare bûne û wiha got: "Hikumeta AKP'ê bi hinceta tevdîrên parastina ku li bajêr tên girtin gefan li Minbicê dixwe."
Ebû Necim wiha got: "Ev xendekên ku Tirkiye besha wê dike, di dema DAIŞ'ê de jî hebûn çima deng jê derneket? DAIŞ'ê li Minbic, Cerablus, Bab û Ezazê gelek xendeq û tunel kolandibûn, lê Tirkiyê wê demê qala wan tehdîdan nedikir."



Ebû Elî destnîşan kir ku tu tehdîd an gef wê vîna wan a di xurtkirina bergiriyên ji bo parastina bajêr de naşkîne û wiha got: "ewlehiya bajarê Minbicê ji bo welatiyên wê girînge."
Ebû Elî Necim destnîşan kir ku Meclisa Leşkerî ya Minbicê gelek şehîd weke şehîd Ebû Leyla, Ebû Emced û gelek şehîdên din dan û wiha got: "Ji bo em bi aramî bijîn me gelek şehîd dan. Em li ser şopa şehîdan dimeşin û ji bo gel bi ewlehî bijî em ê canê xwe feda bikin."
Ebû Elî got: "Dema me dest bi pêngava rizgarkirina Minbicê kir, me soz da şêniyên bajêr ku em ê wan ji DAIŞ'ê xilas bikin û me soza xwe bi cih anî. Niha jî em li ser soza xwe ne û em ê bajarê xwe ji her êrîşan biparêzin."
Cigirê Fermandarê Giştî yê Meclisa Leşkerî ya Minbicê Ebû Elî Necim bi van gotinan axaftina xwe bi dawî kir: "Em weke hêzên leşkerî li vir in. Şervanên me ji şêniyên bajêr in, parastina bajêr ji erkên me yên sereke ne. Koalîsyona Navdewletî hebûna xwe li bajêr berdewam dike û di navbera me de odayên çalakiyên hevbeş ên taybet ji bo parastina Minbicê hene."…*ANHA*

# Bi hezaran Efrîniyan got, "bê serok jiyan nabe"



Efrîniyan kompoloya 9'ê Cotmehê şermezar kirin
Bi hezaran welatiyên Efrînê komploya 9'ê Cotmehê ya li dijî Rêber Ocalan pêk hatî, şermezar kirin.
Bi hezaran welatiyên Efrînê yên li Şehbayê, li navçeya Ehdasê li hev kombûn komploya 9'ê Cotmehê ya navdewletî ya li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar kirin.
Di mîtîngê de wêneyên Rêber Ocalan, pankartên bi nivîsên "Azadiya Ocalan mîsogeriya avakirina netewa demokratîk e, Efrîn serî natewîne, tu kes nikare roja me tarî bike" hatin vekirin û durûşmeyên "bê serok jiyan nabe" hatin gotin.
Di mîtîngê de ji dengê Rêber Ocalan nirxandinên derbarê şoreşa gel de hate guhdar kirin.
Hevserokê Meclisa Zagonsaz a Kantona Efrînê Mihemed Seîd Yûsif axivî û got, "komploya li dijî Rêber Ocalan ji bo ku gelê Kurd nebe xwedî îradeyek azad û neghêjin mafên xwe pêk hat."
Yûsif, got: "20 sal li ser komplo de derbas bû, lê kompoloyê bi têkoşîna rêber Apo, gel û xwîna şehîdan encam negirt."
Endama Koordînasyona Kongreya Star a Kantona Efrînê Hêvî Silêman jî axivî û got: "32 dewlet beşdarî kompoloyê bûn. Wan dewletan hesab nekirin ku girtina rêbertî wê berxwedana gel mezin bike û em ê ji kompoloyên wan re serî natewînin."
Hêvî Silman wiha dewam kir, "şoreşa Rojava şoreşa jin e. Wekî Rêber Apo dibêje, divê hemû jin beşdarî şoreşê bibin, ji ber ku ev şoreş ya jinê ye, her wiha divê girîngiya vê şoreşê nas bikin û ji bo azadiya rêber Apo têkoşînê mezin bikin."
Di çalakiyê de, bavê şehîd Ezîz Ereb, Hesen Şêx Hesen axivî û bang li hemû gelên Rojhilata Navîn kir ku hevgirtina xwe ya li ser bingehê netewa demokratîk xurt bikin û ev tişt anî ziman: "Rêber Apo, rêberê gelan e, ji bo çareserkirina pirsgirêkên Rojhilata Navîn û rizgarkirina gelên bindest tê dikoşe."
Piştî axaftinan mîtîng bi dirûşmeyên şermezarkirina tecrîda li dijî Rêber Ocalan bi dawî bû.

# Bi felsefeya Netewa Demokratîk Komplo têk çû

**Ferîşte NEZÎR**

Bi boneya 20'emîn salvegera Komploya Navneteweyî ya 9'ê Cotmehê, ku di sala 1998'an de li dijî Rêberê gelê kurdistanê Abdulah Ocalan pêk hate niştecihên Qamişlo diyar kirin ku komploya navneteweyî niha li ser gelê Kurd dewam dike."

### RAMANÊ AZAD NAYÊ DÎL GİRTİN

Rêvebera Kongra star a Kantona Qamişlo Şeha Xelîl anî ziman ku 9'ê Cotmehê destpêkirina kompoloyê ku Rêbertî ji xaka Sûriyê derket û bi tecrîd û êrîşa ser Efrînê hîn ev komplo berdewam dike û wiha got: " kompoloya Navnetewî ne kesayeta birêz Ocalan hedef girt, li himberî ramanê wî û felsefaya netewa dîmokratîk bû."
Şeha wiha got: "Di be ku Rêberê me fizîkî di zindana Îmraliyê de dîl girtî be, lê rojana ew fikir di nav gel û cîhanê de belav dibe, ji ber ku raman nayê dîl girtin, Rêber APO ew ramanê azade ji bo wê jî bi serxistina vî ramanî têk çûna kompoloye."


### ÎMRALÎ VEGUHERÎ DİBİSTANÊ

Welatiyê bi navê Bengîn Beyzî kompoloya li ser Rêber Ocalan şermezar kir û wiha got: "Birêz Ocalan ji bo azadiya hemû gelên bindest li himberî sîstema desthilatdar tekoşîn da, jiber ku ev tekoşîn ne li gorî berjewendiyên hêzên navnetewî û taybet dewleta dagirker tirkî bû, hêzên komploger li hember Rêbertî komplo pêk anîn. Ev komplo bi saya keda şehîdan û şopdarên xeta rêbertî vala hate derxistin. Girtîgeha Îmralî veguherî dibistana neteweya demokratîk."

### ŞOREŞ BERSİVA KOMPLOYÊ YE

Nezîr Demîrtaş jî wiha nerînê xwe anî ziman: "Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ket sala 20'an de li Girava Îmraliyê tecrîdkirî ye. Dewleta dagirker Tirk vê kompoloyê bi girakirina tecrîdê ser Rêbertî dewam dike. Ev hêzên Navnetewî ku di nava kompoloyê de cihgirtin ji bo berjewendiyên xwe yên qirêj Rêberêtî dîl girtin, da ku xeyalên azadiya gelên Kurdistanê bikin hedef, ji bo wê jî gelên bindest li himberî van pilanan têkoşîna xwe xurtir dike û di qonaxeke herî girîng de ye. Destkeftiyên Şoreşa Rojava û Bakurê Sûriyê wekî bersiva komplogeran hate kirin, dîrokeke nû hat nivîsandin û komplo bi tekoşînê tê çû."









## Dewleta AKP'ê

**Mihemed ŞAHÎN**

Erdogan bi axavtinên xwe yên Qizilcahamamê mîsoger kir dewleta Tirk bûye dewleta partî ya AKP'ê.
Êdî zagon û makezagon bê wate ne. Nirx û pîvanên herî demokrasiyeke kêm jî tune ne. Di rêveberiya dewletê de ya esas û diyarde AKP'e û berjewendiyên desthilatdariya AKP'ê ne.
Lewre serokê AKP'ê bi hêsanî dikare bibêje heke di hilbijartinên heremî de Kurd careke din dengê xwe bidin namzetên xwe ezê careke din dest danim ser îradeya wan û qayiman pêwirdar bikim. Dixwaze bi gef û şantajan Kurd dengê xwe bidin AKP'ê. Bê guman ev helwesta Erdogan di heman demî de îlana têkçûna siyaseta wî ye.
Rê û rêbazên klasîk ên ku bi sedan sale dîktatorên Rojhilata navîn diceribînin niha serokê AKP'ê dixwaze biceribîne. Mînakên herî dawîn Sedam Huseyîn, Husnu Mubarek, Kadafî, Beşar Esad û hwd. bûn. Wan jî di welatê xwe de hilbijartin pêkdianîn. Ji ber ku herkes neçar bû dengê xwe bide partiya wan her carî ji sedî heştê jortir deng digirtin. Lê bi wan hilbijartinan ne welatê wan dibû demokrat û nejî navê dîktatoriyê ji ser navê wan radibû.
Erdogan dibîne ku piştî hemû qirkirinên siyasî û fizikî yên sê salên dawîn, rûxandinên bajêr û navçeyan, xespkirina îrade û bidestê qayiman desteserkirina şaredariyan dîsa jî Kurd li ber wan çong dananin û teslîmê wan nabin. Dibîne ku li gel hemû zext û zordariyên sê salên dawîn Kurdan dev ji Kurdîtiya xwe, ji nasnameya xwe, ji çanda xwe, ji azadiya xwe bernedaye û xwe nespartine AKP'ê.
Ev sekna Kurdê berxwedêr serokê AKP'ê gelek aciz dike. Lewre li Kurdan gefan dixwe û dibêje hewceye em tedbîrên din bistînin.
Ew tedbîr çine? Tedbîrên çewisandin û teslîm girtina civakê ne. Tedbîrên rêvberiyên otokratîk in, tedbîrên dewleta partiyê, yên dewleta AKP'ê ne. Yanî tedbîrên Sedam û Esad yên rejîmên BAAS'in , tedbîrên partiya CHP'ê yên ji sala 1920'an hetanî sala 1946'an in. Ji sala 1920'an hetanî 1946'an dewleta CHP'ê hebû niha jî dewleta AKP'ê heye. Di wê serdemê de hemû tişt li gorî berjewendiyên desthilatdariya CHP'ê dihat dizaynkirin, niha jî hemû tişt li gorî berjewendiyên desthilatdariya AKP'ê tê dîzaynkirin. Di wê serdemê de her kes neçar bû dengê xwe bide CHP'ê nihajî her kes neçare dengê xwe bide AKP'ê. Di wê serdemê de "şefên mîllî" Mistefa Kemal û İsmet bûn niha jî Erdogan e. Xala hevpar a herdû partiyan dijberiya civaka Kurde.
Li Tirkiyê dibe ku di şexsê partiyan de pergala dewletê biguhere, dibe "Şefên Mîlî" biguherin, dibe hemû tişt serûbino bibe lê tiştek qet naguhere. Ew jî siyaseta qirkirin û tunekirina civaka Kurde.
Dewleta CHP'ê hişmendiya Îtîhat Terakî ya nîjadperest esas digirt. Di dijberiya Kurdan de tu pîvan nasnedikir, serdema wê serdema qirkirin, teslîm girtin û tunekirina civaka Kurd bû. Niha dewleta AKP'ê jî heman hişmendiyê esas digre. Di dijberiya Kurdan de tu pîvan nasnake. Ew jî di siyaseta qirkirin, teslîm girtin û tunekirinê de bi israr e.
Li gorî hişmendiya wan a nîjadperest a gemarî Civakeke Kurd tune ye, qaşo Kurd hene. Lê hewceye ev qaşo Kurd jî ji xwe re nebêjin em Kurd in û Kurdî neaxivin. Hewceye doza çand, ziman, nasname û hebûna xwe nekin. Ji bo wan daxwazan dernekevin ser çiyan û liberxwe nedin. Heke ji bo wan xwestekên xwe bi awayeke legal û aştiyane siyasetê jî bikin bila dengên xwe nedin partiyên xwe. Heke deng bidin partiya xwe hewceye bi tevî partiya xwe ve di bin bendê de bimînin. Di cîhanê de bila tu dost, heval û hevkarên Kurdan tune bin. Dema ku ev qaşo Kurd mirî bila tirba wî jî tunebe, heke tirba wê hebe bila li ser tirbê nivîsa Kurdî tune be…
Belê êdî li Tirikyê dewleta AKP'ê heye. Gotin û axaftinên serokê AKP'ê ferman û zagonin. Polîs, dozger û dadger hemû 24 saet amade li devê wî dinêhirin. Serokê AKP'ê di 7'ê Cotmehê de li Qizilcahamamê li Kurdan gef xwarin û qala tedbîrên nû kir. Di 9'ê Cotmehê de em bi operasyoneke qirkirina siyasî ya dorfireh şiyar bûn. Di 9 bajêran de di bin navê lêgerînê de 183 mal hatin serûbinokirin û ji sedî zêdetir siyasetmedar û rojnameger hatin binçavkirin.
Encamên vê siyasetê di rewşa Iraq, Misir, Lîbya û Sûriyê de diyare.